# “LI SER REWŞENBÎRAN MUXALÎFÎ Û ALÎGIRÎ TÊ ÇESPANDIN”

**Hejarê Şamil**

## *Hevpeyvîn bi Kînyazê Îbrahîm re*




Kînyazê Îbrahîm Mîrzoyêv, Hejarê Şamil (Gajar Askerov) û xebatkarên kovara 'Nûbar'.

CAUCASUS KURDISH SCIENTIFIC RESEARCH CENTER
Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê
405632427

*Min di sala 2006'an de me bi profesor Knyaz Îbrahîm re sohbeta jêrîn kiribû. Pêşî li ser malpera kurdistan-post.eu hat weşandin. Paşê me ew di pirtûka "Jiyanek Di Rêya Welatparêziyê de" ya ku behsa riya jiyana profesor dike, dubare weşand. Hevpeyvîn piştî wefata mamosta di hejmara 2022an a kovara 'Nûbar'ê de jî cîh girt.*
*Kînyaze Îbrahîm du sal berê di 09ê Tebaxa 2021ê de koça dawî kir. Ew di 01 Gulanê 1947 de ji dayik bûye.*

*Me di sala 2006an de wek du hevalên nêzîk sohbet kiribûn û ev hevpeyvîn derketibû holê. Di hevpeyvînê de de fikrên girîng hene û îro jî qet girîngiya xwe winda nekiriye.*

***Kînyazê Îbrahîm Mîrzoyêv:***
**"LI SER REWŞENBÎRAN MUXALÎFÎ Û ALÎGIRÎ TÊ ÇESPANDIN"**
Sala 2006

**Hevpeyvîn bi Knyazê Îbrahîm re, ku profesorê wêjeyê, akademîsyen û serekê Yekîtîya Kurdên Qazaxistanê ye.**

***"Mirovê xwedî hizir, gava ku ji rêxistinekê re bi temamî dibêje "erê" dibe propagandavanê wê û gava ku bi temamî wê rêxistinê xirab dike, dibe dijberê wê. Divê em hêzan bi rengê xirab û qencan hilnedin dest. Ji ber ku weke ku di navbera mirovan da yên bi temamî qenc an jî xirab tunene, di rêxistinan da jî tunene. Her kes bi livandinên xwe carna pêş dixin û carna jî paş va dixin û her wiha xwedî pratîk û polîtîkayê ne. Hebûn na, livandinên mirovan dikare bibe mijara rexneyan.***

***Li ser rewşenbîran timê muxalîfî û alîgirî tê çespandin. Bi ya min ê ku muxalîfîya rewşenbîr bi wateya sekna serbixwe bê pejirandin. Ew muxalîfîya sîyasî û alîgirîya sîyasî ku tê çespandin, bi îtbara xweserîyê ne cuda ne. Lê belê ew ronahîbûna ku tu destnîşan dikî, ew ronahî ye ku raserê bergeha sîyasetê ye.***

*Divê rewşenbîr di hemû qadên jîyanê yên weke civakî, sîyasî, wêjeyî, çandî û hwd. da muxalîfîya xwe ya ramanî nîşan bide. Lê belê muxalîfîya rewşenbîr divê bi şertê afirandinêrîyê va girêdayî be. Rewşenbîr tenê bi rexne na, bêtir jî bi afirandinê va serbar e. Rexneya wî veşartî ye, di qenctirînê da, di rastînê da û di xweşiktirînê de. Ev*

*çemka rewşenbîrîyê dikare rewşenbîr bide rûniştandin, di jîyana civakî ya layiq de.*”

**Knyazê Îbrahîm**

Zanyarê rojhilat, kurdnas, rexnegirê wêjeyê, wergêr, doktorê zanista fîlologîyê, profesor, akademîsyenê Akademîya Zanistên Dibistanên Bilind ên Navneteweyî û Akademîya Zanistên Civakî ya Qazaxistanê û serekê Yekîtîya Kurdên Qazaxistanê.

Di 1’ê Gulana 1947’an da li Ermenîstanê ji dayik bûye.

Knyazê Îbrahîm (Mîrzoyev) salên dirêj di Ûnîvêrsîteya Dewleta Ermenîstanê da serektîya ziman û wêjeya Azerbaycanê kiriye. Di şerê navbera azerî û ermenîyan da kurd mecbûr bû ku koçî berî Qazaxistanê bivin. Niha di Ûnîvêrsîteya ser navê Abaye dewletê li Almatê serekê navenda zimanên cîhanê ye.

Knyazê Îbrahîm li bajarên weke Parîs, Berlîn, Bruksel û yêd mayînda endamê desteyên zanistî yên Enstîtû û Ûnîvêrsîteyan e. Li bajarên weke Almatê, Moskva, Sankt-Petersburg, Tiflîs, Parîs, Berlîn, Amsterdam û Bruksel beşdarî konferansên zanistî û teorîk bûye.

K. Îbrahîm bûye endamê yekîtîya nivîskarên YKSS, serekê para Azerbaycanê ya yekîtîya nivîskarên Ermenîstanê û redaktorîya kovara “Edebî Ermenîstan” kirîye. Niha jî endamê yekîtîya nivîskarên Qazaxistanê, endamê yekîtîya rojnamevanên Qazaxistanê û endamê PENa Kurde. Her wiha rêdaktore kovara ”Nûbar”e ku li Almatê dertê û nivîsên zimanê kurdî, rûsî û qazaxî tê da peyda dibin.

K. Îbrahîm di jîyana civakî û sîyasî ya kurdên Sovêt û Qazaxistanê da xwedî roleke aktîf e. Endamê Parlementoya Kurdistanê ya li Sirgûnê ye. Dîsa di sala 1991’ê da bûye serekê kurdên YKSS’yê. Her wiha cîgirê serekê Yekîtîya Komeleyên Kurd ên Navneteweyî ye.

Pirtûka wî ya dawî ”Ansîklopedîya kurd a biçûk” hatîye wergerandin ji bo zimanên rûsî, îngilîzî û qazaxî. Dîsa heman pirtûk tê wergerandin ji bo zimanê holendî û tirkî.

Di sala 1998’an da ji ber xizmeta xwe ya di warê hîndekarî û jîyana civakî da, ji hêla Komara Qazaxistanê va madalyona ”Rêzdarîyê” wergirtîye.

Zimanên weke kurdî, azerî, rûsî, ermenî, farisî, tirkî, qazaxî û ûzbekî dizane.

Bi akademîsyen Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev re di meha sibata 2006’an da, li bajarê Almata Qazaxistanê, min ev rêportaj pêk anî. Min destpêkê berîya 11 salan gotinên ku di navbera me da derbas bûbûn anî bîra wî:

**ME ŞERÊ NAVXWEYÎ DI SEDSALA 20. da HIŞT**

*Hejarê Şamîl:* **Mamoste Knyaz, di sala1995’an da min tu di dema ”Konferansa kurdên CDS” da li wê hotêla ku tu lê dimayî da zîyaret kiribû. Di wê pêvajoyê da di navbera rêxistinên kurdan da şer hebû. Çendî ku me nexwestebû jî bingehê sohbeta me ew mijar bû. Min wê demê alîyê hêzekî girtibû ku di nava şer da bû. We bi sebireke mezin gotinên min ên tijî peyvên propagandayê guhdarî kiribû û van gotinên hanê rêz kiribû, ku minê ti carî ji bîr nekiriba:**

**“Birazî, ez hestên te fam dikim. Çi gumana min ji jidilbûna te nîn e. Lê belê zimanê rastînan ne weke zimanê hestan e. Du kurd li hember hev çek radikin û heke kurdê sêyem ranabe û vî şerî nade rawesitandin, ew dibe hevparê vî sûcî. Her wiha di vî şerî da em tev sûcdar in. Dema ku kurd bi rengekî rêxistinkirî li hember hev çek bi kar bînin, ew dibe tragedîya neteweyî. Alî girtin ne ew nêzîkatî ye ku tragedîyê ji holê rabike. Ger alîgirtin pêwîst bike, divê ew bibe aligirtina yekîtî, yekbûnî û aştîya navbera kurdan. Ew kesê ku ji xwe re dibêje ez rewşenbîr im, nikare ji bilî vê bibe xwedîyê sekneke din. Ger sekneke din li ser xwe pêk bîne, hingê dê bi benzîne bazde ser êgir. Hemû rêzanên kurdan destnîşan kirine ku, bingehîn sedemê facîaya dîrokî ya ku gelê me dij e, şerê navxweyî ye. Yek ji van ê ku vê rewşê baş pênase kiriye Ehmedê Xanî ye. Berîya çarsed salan wiha gotîye:** “Ger dê hebûya me îttîfaqek / Vêkra bikira me înqiyadek / Rom û Ereb û Ecem temamî / Hem'yan ji me re dikir xulamî”

**Ger em Ehmedê Xanî weke kesayetekî kurd ê bilind bihesibînin, divê em qîmet û hêjayî bidine ramana wî. Divê pevçûn û şer di nav kurdan da ne hestên alîgirtinê, lê hestên şermê bide avakirin.**

**Lê belê dinya diguhere, kurd jî bi wê dinya ku diguhere re, divê ji nû va vegerin û li xwe mêze bikin. Ew pevçûnên bixwîn ên navbera kurdan ne çarenûs e. Bi ya min dê gelê me wan pevçûnên di sedsala 20an da bihêle û wisa bikeve sedsala 21.!”**

**Çendî ku wê demê ji van gotinên we bibandor bûbûm jî, min wê bawerîya xwe ya ku min digot rast e û alîyê ”yê ku mafdar e”**

**girtibû. Lê ji ber ku li hember we rêzdarîya min hebû, min pêwîstî neditibû bi xwe re ku we bibersivînim.**

**Niha em di 6 salîya sedsala 21. da ne. Ew pevçûnên di navbera rêxistinên kurdan da di dawîya sedsalê da xwe nîşan dabûn. Ji bilî bûyerên kuştinê yên ku di navbera rêxistinan da qewimîbûn, çek di dest da em pev naçin. Ew lîderên kurdan ku her yek ji wan alîyekî şer bû, ragihandinên mînanî ”ji niha û pê va dê kurd li hember hev çekê ranekin” ku dilê mirov xweş dike bi lêv dikin. Pratîkên ku têne sepandin van ragihandinan piştrast dikin. Hizra min ewe ku di navbera kurdan da pevçûnên rêxistinkirî qedîyane. Gelê me dê careke din destûr nede van tragedîyên wiha neteweyî.**

**We berîya deh salan weke pêxemberekî gotibû ”Dê gelê me wan pevçûnên di sedsala 20an da bihêle û wisa bikeve sedsala 21ê” û ez ji ber vê pêşbînîyê we pîroz dikim. Ger ku hûn di vê pîrozkirina derengmayî da qisûrekê nebînin...**

*Knyazê Îbrahîm:*

Piştî ku Yekîtîya Sovêtê hilweşîya, eşkere bû ku rastîya kurd a ku di bin sîya bîrdozîya bloka sosyalîst da bîçim girtibû bi pêvajoyê re wê rengê xwe biguhêre. Rewşa objektîf, rengê veguherîna cîhanê û faktorên konjûktûrel vê nîşan didan. Mercên sûbjektîf ên derveyîn û hundirîn tenê dikaribûn leza projeya veguherînê kêm bikin an jî zêde bikin. Bi konjûktûra navneteweyî ya ku piştî salên 1990'î tevgerên azadîya kurd fersend peyda kirin ku pratîk û pêvajoyên xwe yên pêşveçûnê bi rengekî kûr di ber çavan re derbas bikin. Ev fersendên çonayetîyê weke rêpîvanekê di wan pêvajoyên serûbinbûnê da rû didin. Kurd giran ketin di karê xwe gihandina pêvajoyê da, lê bê tevger jî neman.

Cîhana du cemserî ji alîyê bandora faktorên derveyîn va guncav bû ku bêahengîyekê biqewimîne di şûngehê sîyasî yê kurd û nakokîyên navbera kurdan de. Yek jî, berevajîyê weke ku dihate payîn, Sovêt ku ti carî tevkarî nekirine ji bo pirsa kurdî, çi projeyeke wan tunebû û nebû ku xwestekên azadîya sîyasî ku bi rengê serxwebûn, federasyon an jî otonomîyê dihatine formûlekirin. Yekîtîya Sovêtê weke faktorê alîkar li pirsa kurdî di polîtîkayên Tirkîye, Îran, Îraq û Surîyê de nihêrtîye. Faktora kurd ji alîyê Sovêtê va bi taybetî ji bo wan dewletan, di giştî da jî bandor û destwerdana li ser Rojhilata Navîn bû. Û projeyeke Sovêtan tunebû ku kurdan di Rojhilata Navîn da bîne rewşeke bandordar û statûkvoyên heyî biguherîne. ”Navenda vebûna cîhana ereb, Îraqa dost ku li hember împeryalîzmê serî radike”, ”Meyildarê sosyalîst, Surîya

dijberê împeryalîst”, ”Ji alîyê jêopolîtîk û aborî va Îrana dost ku dijminê împeryalîzmê ye” û ”Tevî ku di enîya împeryalîst da ye Tirkîyeya bêxisar” Sovêtan nerihet nedikir, bi gotineke rasttir, bi gor berjewendîyên rêveberîya Moskvayê bû. Bi taybetî piştî salên 70î ew bawerîya îdeologên sosyalîst ku digotin emê şoreşa sosyalîst li tevahî cîhanê belav bikin rahejîyabû. Berevajî ev rewşa ku li Sovêtê dihate jîn, hêvîyên kurdan ji YKSS bi bingeh bûn. Bloka kapîtalîst ku kurd bi rengekî bêbawerî nêzîkê wan dibûn, ji ber hevsenga Sovêtê xwe nedidane ber ku li Rojhilata Navîn guhertineke rehdar pêk were. Berevajîyê vê jî rast bû. Sovêtên ku cîhan bi kapîtalîstan re parve kiribûn, pêmen bûn ji wê hewes û hêza xirabkarîya hevsengê. Di dawîya salên 70î da YKSS destwerdana Afganistanê kir û tê da asê ma. Ev yek hişt ku hemû hewesa Sovêtê ya belavbûnê bişikê. Ew gel û civatên ku li Rojhilata Navîn di rêkên cuda da têkoşîna xwe didan, hêza wan tunebû ku wê statûya li dijî gelan hatîye avakirin bişkînin.

Mixabîn, manêvrayên ku kurdan di navbera herdû sîsteman da bi rengekî neçarî pêk anîn, wan nebir encamên rehdar. Tenê dihişt ku rojên xwe bi têkoşînê felat bikin. kurd di navbera sîstem û dewletan da erçiqandî mabûn û bûbûne mehkûm ku di navbera xwe da jî wê polîtîkaya kevneşopî ya şerê navxweyî bidomînin. Ew dewlet û hêzên mêtînger ên sereke ku di hundirê herdu sîstêman da cih girtibûn, kurdan bi rengekî stemkar bi kar dianîn. Hilweşîna Sovêtan dê guherînên bingehîn anîbana ji bo kurdan. Dê fersendan afirandibaya ji bo çareserîya pirsa kurd.

Şerê navxweyî, weke rastîyekê encamê bêçareserîyê bûn. Navekî din ê xilasbûna şerê navxweyî, ber bi çareserîya pirsa kurd va çûyîn e. Bi hilweşîna Sovêtê re dihate dîtin ku dê pirsa kurd bi vî an jî bi wî şiklî bikeve rîya çareserîyê. Bi mantiqekî wiha divê neyê hizirandin ku li pêşîya pirsa kurd astenga bingehîn Yekîtîya Sovêtê heye. Mebest ewe ku sîstêma du cemser û asta nakokîya di navbera wan da, hiştibû ku ev pirs were halê bêçareserîyê.

## EM JI QONAXA BELAVKIRINÊ DIGIHÊN QONAXA AVAKIRINÊ

*Hejarê Şamîl:* **Profesor, hûn bawerîya xwe ya berîya 11 salan diparêzin? Şerê navxweyî yê kurdan, gelo li paş ma? Gelo daxaza mezin ya Ehmedê Xanî dikeve qonaxa pêkhatinê?**

*Knyazê Îbrahîm:* Bê guman diparêzim. Dilşa me. Vekolîna nîvenga sîyasî, civakî û aborî ya li Kurdistanê ava bûye, derfet dide ku em baştirîn karibin xwe bigihînin pêşbînîyên pêşerojê. Di panorama Kurdistanê da xetên hêvî diafirînin zêde ne. Parametrên hizra me tên guhertin. Em ji qonaxa belavkirinê digihên qonaxa avakirinê.

*Hejarê Şamîl:* **Ger ez îro bi profesorekî wêjeyê re, ku di mijarên ziman û wêjeyê da bûye layiqê navdarîya akademîk dûr û dirêj ser sîyasetê gotûbêj dikim, ne ji xwesteka min tê, ji ber neçarîyê ye. Bavê min ê xwedê rehma xwe lê bike timê digot: ”Te peyva kurd bi kar anî, ji wê gavê pê va tu sîyasetê dikî.” Bi rastî jî wisa ye. kurdê bêdewlet, ziman, çand û hemû hebûnîya wê ya neteweyî ku di bin zextê da ye, em mafên sîyasî û çandî deynin wî alî, çîroka wî ya ku vegotina wê çêlekê dike, ku ketîye bostanê cînar, weke sîyasî tê fêmkirin. Ev jî nakokîya çarenûsê ye. Hûn weke profesorekî ziman û wêjeyê, ku hemû jîyana xwe daye ser rîya dostanîya wêje û gelan, li gelşa têkilîya kurd û sîyasetê çawa dinêrin? Ez bi xwe di wê gumanê da me, ku sîyaseta kurd tenê ji alîyê ew kesên ku navê wan sîyasetmedar e tê meşandin.**

*Knyazê Îbrahîm:* Şamîl Esgerov, rehma xwedê lê be, ew kesayet e ku gelek xizmet daye gel û kurdekî ansîklopedîke. Mirov nikare tenê peyveke wî jî bavêje der.

Tevî ku Ehmedê Xanî û Cegerxwîn temsîlkarên bêhempa yên gîyana gelê kurdin, ramana sîyasî ya kurd anîne ziman, xistine sîstem û bi zimanekî lîrîk vegotine. Ma sîyaset ne ew hunerê parastina berjewendîyên wê civata ku tu xwemalê wî yî? Dibe ku Ehmedê Xanî sîyaseta pratîk nekiribe, lê belê di formulekirina ramana sîyasî ya kurd da, di sefandinê da xizmeta bêhempa daye. Cegerxwîn ew helbestvan e ku, bi jîrekatîya lîrîk û sîyasî girse rakirine ser pîyan. Hunermendê hemçerxê me Şivan Perwer di livandina dînamîkên civaka kurd da qasî serokê rêxistinekê xizmet kiriye. Têkilîya wêje û hunerê bi rengekî neyekser bi sîyasetê re heye.

## EZÊ TIRKÎYÊ BIDIME DADGEHA MAFÊN MIROVAN A EWRÛPA

*Hejarê Şamîl:* **Hûn bi tirkî baş dizanin. Hûn li Qazaxistanê ji bo zarokên tirk programên dersê amade dikin. Bi gotina**




**akademisyenekî qazax, ”bavîtîya zarokên tirk” dikin. Salên dirêj di ûnîversiteya dewletê ya Erîvanê da hûn bûn dekanê fakûlteya ziman û wêjeya Azerbaycanê. Bi sedhezaran azerî li Ermenîstanê dijîyan û tenê yek fakûlteya azerî hebû. Bi gotina akademisyen Nadir Nadirov ”kurd bû kurd jîya” ku kurdekî li wê fakulteyê dekantî dikir, ev yek tiştekî mezin bû. Niha mijara me ne eve. Ez dixwazim mijarê bînim bûyereke dawî. Knyazê Îbrahîm, ku jîyana xwe daye ber rîya dostanîya gelan û derheqa dostanîya gelên kurd û azerî da berheman afirandîye, li balefirgeha Stenbolê nehiştin ku bikeve hundir. Bi ”fermana wezîrê karê derve” hûn hatine zivirandin ji bo Almatê. Divê ev yek çawa bê ravekirin? Dibe ku ez hesta we ya bawerîya kûr a biratîya gelan biêşînim, lê belê ez van gotinan nebêjim ezê hedar nekim: ”Tirk ji ber ku kurdan weke gel nahesibînin û ew kesên ku ji xwe re dibêjin em kurdin weke mirov nabînin, xebata we ya bi navê dostanîya wêje û gelên kurd û tirk ji bo xwe weke heqaret hesibandine û ji ber vê sedemê hûn nexistine hundirê welatê xwe.”**

*Knyazê Îbrahîm:* Di 19ê îlona sala 2005’an da demeke dirêj ez li balafirgeha navneteweyî ya Stenbolê dame sekinandin û paşê hatime zivirandin. Ev bûyereke wisa ye ku ji her şiroveyê re vekirî ye. Welatekî ku dibêje ez dêmokrat im û pî dikole li ber derîyê Yekîtîya Ewrûpayê, bêyî ti sedem nîşan bide û helwestekî wisa nîşan bide, di serî da piştrast dike ku bi wan rêgezên ku pejirandîye re nakokîyeke rişt jîyan dike.

Ez hatibûme dawetkirin ji bo dîroka 21-25 Îlona 2005’an ji hêla Dewleta Federe ya Kurdistanê, ku dê festîvala çanda kurd a navneteweyî pêk bihata. Ji bo ku li ser Tirkîyê derbasî Kurdistanê bibim çûbûm Stenbolê. Piştî ku demeke dirêj li wir hatime sekinandin, ji minra gotin

ku dê min bizivirînin Almatê. Min ji wan memûran re got ”Ez zanyar im, ne têrorîst im. Mafê we tune ye ku hûn min paşve bizivirînin”. Memûrekî payebilind wiha got: ”Lê belê ferqa we kêm e. Mamoste, hûn jî bi pênûsa xwe cihêxwazîyê dikin!” Ez hê jî nikarim fêm bikim ku çawa mamûrekî payebilind yê tirk dikare li hemwelatîyekî Qazaxistanê heqareteke wiha bike. Tirkîye bi zivirandina min him zagonên xwe û him jî zagona mafê gerîna navneteweyî binpê kiriye. Ji sedemê vê bûyerê, ez amadekarîya xwe dikim ku di dadgeha mafên mirovan a Ewrûpayê da li hember komara Tirkîyê doz vekim.

## EM DIBIN "TEWANBARÎYA NE JI ME" da NE

*Hejarê Şamîl:* **Ev gotinên we dihêlin ku wan xisûsên min negirtibû rojeva xwe destnîşan bikim. Dibe ku hatibe guhê we jî. Min di derbarê we da gelek gotûgotên rêxistinkirî bihîst. Demekê hinek derdoran ji bo we digotin "zilamê ermenîyan". Di sala 1989'an da bi deh hezaran kurdan re hûn ji wî welatî hatine derxistin. Paşê gotin "zilamê azerîyan". Di nivîsên ku di derbarê we da di çapemenîya Azerbaycanê da derketine dîyar dibe ku hûn weke "non grant" (zilamê nayê xwestin) hatine ragihandin. Di van salên dawî da jî hûn bûn "zilamê tirkan". Lê hûn jî amadekarîyên xwe dikin ku di derbarê Tirkîyê da doz vebikin...**

*Knyazê Îbrahîm:* Birazî, çi kêmanî û zêdayîya gelan ji hev nîn e. Dostanî û biratîya gelan jî ne têgehên razber in. Dostanîya gelekî bi yê din re, bi dostanîya wan kesên din pêk tê. Bi sedan dostên min ên azerî, ermenî, tirk, qazax û rûs hene. Em bi hizra ku emê tevkarîyê ji bo gelên xwe bikin nebûne dost. Têkilîyên normal yên mirovanî yên di navbera du mirovan da xwe gihandin dostanîyê. Lê belê heke me nasnameya xwe ya êtnîk biçûk dîtibaya, bi misogerî meyê nikarîbûya dostanî ava bikira. Ji ber ku ermenî û azerî û tirk qirên dikin, ez nikarim pişta xwe vegerim dostê xwe yê ermenî yan jî yê din. Felsefeya min a jîyanê eve. Qasî kurdan ji gelên din jî dostên min hene. Lê belê ez kurd hatime dinê, kurd jîyam û ezê weke kurdekî bimirim. Ew gotûgotên ku di derbarê min da belav bûn jî, karê wan kesan e ku dev ji neteweyên din berde, bi mirovên xwe re jî nikarin têkilîyeke mirovanî deynin. Karê wan kesê ji xwe aciz e ku ji bo gelê xwe nikarin kevirekî deynin ser hev.

Berîya çend salan ji bo daîreyên dewleta Qazaxistanê di derbarê min da gelek nameyên gilîkirinê hatibûne nivîsandin. Di nameyekê da dihate

nivîsîn ku ez bi dewleta tirk re di nav têkilîyan da me û li mala min wêneyê Atatirk heye û di paragrafa din da jî dihate gotin ku ez endamê rêxistina PKK'yê me...

Di sala 1995'an da di rojnameyeke tirk a mezin da dihate nivîsîn ku ez serekê navenda kurd a virê me û bi rengê "PKK li Qazaxistanê" manşet vekiribû. Ji xwe mantiqa wan kesên nexweşê gîyanê wisa ye.

Jîyana rewşenbîrekî kurd ku ramana azad diparêze û şêwaza livandina serbixwe bingeh digire, bi zehmetî û zorîyên mezin derbaz bûye. Bi îdîaya ku nêzîkî hêzekê yî, ji alîyê hêza din va têyî tewanbarkirin. Rewşa min balkêştir e. Min sekneke serbixwe esas girtîye û min tim xwestîye ku bi her kesî re di heman dûrbûnê da bim. Tevî ku kes wêrekî bi xwe re nabîne û li hember min nabêje jî, ji paş va ji alîyê gelek kesan va hatime tewanbarkirin. Ez ji bo vê dibêjim, "tewanbarîya ew kesên ne ji me ne!" A herî bijan ewe ku, tu ji hêla wan kesan va têyî tewanbarkirin ku te ji bo wan 40 salî xizmet daye û hemnijadê te ne...



Civîna Înîsîyatîfa Rewşenbîrên Kurdistanê. Qazaxistan, Almati (26 Hezîran2016). Rûniştî: Hejarê Şamil, Kînyazê Îbrahîm, Nadir Nadirov.

## DIVÊ HEBÛNA RÊXISTINAN NA, KIRYARÊN WAN BÊ REXNEKIRIN

*Hejarê Şamîl:* **“Alîgirtin” mijareke sotîner e. Divê rewşenbîrek bibe alî an na? “Alînegirtin” bi minra wateyeke dîtbarî dide çêkirin. Ji alîyê din va ew rewşenbîrên ku di mijarên wêjeyî, çandî, hunerî û sîyasî da ked dirijînin “alîgirtin”a wan bi wateya rast a gotinê sîyekê dadixe ser rewşenbîrîyê. Ji ber ku bingehîn mercê rewşenbîrbûnê bi pijdana ramanê ber bi muxalîfîyê va çûyîn e. Bi vê wateyê “alînegirtin”a wî qasî ku wî bîne rewşa “dijber” tûj dibe.**

**Ev pênaseya wê “tewanbarkirina ew kesên ne ji me” li xweşa min hat. Ji ber bandorî û sekna rewşenbîran, ku timê zor li ser wan tê kirin ji bo ku bibin alî, tiştekî xwezayî ye. We got, “min tim xwestîye ku ji her kesî re di heman dûrbûnê da bim”. Gelo di heman dûrbûnê da mayîn dibe raderbirîna pratîka rast a rewşenbîrên rast?**

*Knyazê Îbrahîm:* Wekhevî û di heman dûrbûnê da mayîn sekneke nispî ye. Ji ber ku tu nikarî wê dûrbûna di navbera xwe û kes, hêz û ramanên cuda da bipîvî. Di vir da mijara gotinê çemk e. Mînak, em gelşê têkilîya bi rêxistinên kurd va hildin dest. Di pêvajoyên cuda-cuda da ji ber raman û pratîkê xwe nêzîkê yekê dibî. Bi rêxistina din re bi rengekî xuyayî dûrbûnek pêk tê. Ev, ew pêvajo, polîtîkayên ku ji hêla rêxistinê va têne birêvebirin û pozîsyona ku tê da peyda dibin re eleqedar e. A ku dîyarkere eve. Lê belê ji bo rewşenbîrekî, bi rêxistinê re weke dîtbarî nêzîkbûn, bi rêxistinên din re jî dûrbûn, vêca wateyeke bi rengekî ku tu dibî berevajîyê wan, dibî dijberê wan bi xwe re nayine. Divê wisa neyê fêmkirin jî.

Rewşenbîrê kurd ne xwedî wê lûksê ye ku nêzîkatîyên bîrdozî, sîyasî û pratîk ên rêxistinekê yekser bipejirîne û bikeve rewşa propagandavanê wê. Di dîroka mirovatîyê da kesek nîn e ku bi propagandavanîya sîstemê xwe gihandîye navdarîyê. Rewşenbîrê mezin Mîxayil Şoloxov propagandaya partîya komûnîst a YKSS kiriye, lê belê yê ku ew kiriye rewşenbîr ne propaganda ye, hostatîya hunerî ya mezin û gîyana wî ya serbixwe ye, ku xwe teyisandîye ramanên wî yên muxalîf. Tu dizanî, Şoloxov di Sovêtê da yekem nivîskar e ku di saxîya xwe da xelata Nobelê wergirtîye.

Mirovê hizirvan, ku rêxistinekê re bi temamî bêje erê dibe propagandevanê wê, ku bi temamî jî bêje na dibe dijberê wê. A baş ewe ku divê mirov hêzan bi gora qenc û xiraban parve neke. Çawa ku di nav

mirovan da nîn e, di nav rêxistinan da jî qenc û xirabên mitlaq peyda nabin. Lê belê livbazîya ku pêşve dibe û ya paşve dibe heye. Polîtîka û pratîkên wisa hene. Divê ne hebûnî,lê livandinên wan bên pesindan û ji bo rastkirinê bên rexnekirin.

## A KU REWŞENBÎR AFIRANDÎYE Û YA HERÎ BAŞE, RAST E Û XWEŞIK E, REXNEYA WÎ YE

*Hejarê Şamîl:* **Çi mixabîn e ku rewşenbîrên kurd ên bi sekna Şoloxov di roja îroyîn da mûstesna ne. A rastî di Sovêta berê da Şoloxovê ku xwedî ramana rewşenbirîyê bû bi wateya helwestê ne xwedî zêde hevalan bû. Rewşenbîrên kurd, bi wateya ku helwesta muxalîfîyê ku ev bingehîn mercê rewşenbîrîyê ye şûna ku raxin, -ezê bi gotineke pir nerm bibêjim -“ji ber gelek şayişên jîyanî û sîyasî bi tilarî tevdigerin”. Rewşenbîrên kurd derfetên huner û wêjeyê ku raserî bîrdozîyê ye, di pîvaneke têr da nikarin bi kar bînin. Ev yek jî dihêle ku, di jîyana civakî ya gelê me da şûna ku bibin rêber, zêdetir dibine paşajo. Hûn bi giştî rewşenbîrên kurd ên îroyîn çawa dibînin?**

*Knyazê Îbrahîm:* Ger em pîvanên îdeal xêz bikin û di nav da li rewşenbîr bigerin, em hingê nikarin xwe bigihînin nêzîkatîyeke rasyonel. Di sedsalan da carekê Ehmedê Xanî’yek dertê. Ew kevirên bingehîn in...

Ez hêvîdar im ku dema em dibêjin helwesta mûxalîfîyê, tu wê danexî tenê nav sînorên helwesta mûxalîfîya sîyasî. Li ser rewşenbîran timê tê çespandin ku wî têkine mûxalîfê sîyasî û bibe alîyek. Bi ya min divê muxalîfîya rewşenbîr bi rengê sekna wî ya serbixwe bê fêmkirin. Mûxalîfîya sîyasî ya ku tê çespandin, bi xweserîya xwe ji alîgirtina sîyasî cuda nîne. Lê belê ew rewşenbîrê ku te destnîşan kir, ew xwedî bergeheke raserî sîyasetê ye.

Divê rewşenbîr di hemû qadên jîyanê de; civakî, sîyasî, wêjeyî, çandî... da mûxalîfîya ramanî nîşan bide. Lê belê mûxalîfîya rewşenbîr bi afirandinê va mercdar e. Rewşenbîr tenê bi rexnekirinê re na, zêdetir jî bi afirandinê re peywîrdar e. Rexne û afirandina wî di ya herî qenc, rast û xweşik da veşartî ye. Ger çemka muxalîfîyê wisa be, wê demê dikare di nav jîyana civakî da li wî cîyê layiq xwe bide rûniştandin.

## TÊKILÎYÊN DI NAVBERA RÊXISTINAN DA MIJARA LÊKOLÎNA ZANISTÎ Û AKADEMÎKE

*Hejarê Şamîl:* Dema ku mirov qala têkilîya rewşenbîr û rêxistinê dike, mijareke birîndar tê hişê mirov: têkilîya navbera rêxistinan. Dibe ku hûn zêde li ser ranewestîyabin û ev mijareke derveyî warê lêkolîna zanistî be. Lê belê weke kesayetekî ku vekolîna dîroka Kurdistanê pêk anîye û nîvenga civakî ya rojaneyî dişopîne ramanên we girîng dibînim. Weke dîtbarî ez bibêjim: Kengê ku Kurdistan bû du parçe û hetanî sedsala 20an di nav kurdan da binkeya civakî ya herî rêxistinkirî eşîr bûn. Paşê bi bingehê eşîrîyê bi xarektera çînayetîyê rêxistin derketin. Tecrûbeya van 50 salên dawî, ku têkoşîna rêxistinên kurdan bi rengê neteweyî, rastîneke gelek sotîner deranîye holê. Têkilîyên navbera rêxistinên kurdan ji alîyê yekbûnê va ji têkilîyên eşîrî şûndetir dimîne. Em nebûne nasdar ku ne di parçeyekî da û ne jî li seranserê Kurdistanê ew rêxistinên nûjen rabin û polîtîkayên hevpar ava bikin, bi demdirêji bi hev re tevbigerin. (Piştî destwerdana Îraqê sereke rêxistinên Başûr ji ber zexta DYA û sûdwergirtina konjûktûrel, weke neçarîyekê ketine nav hewldanên avakirina polîtîkayên hevpar). Lê belê di dîroka me da tevî ku eşîran şerên pir bixwînî li dar xistinê jî, li kêleka vê rastînê li hember ew tiştên ku weke dijmin nasîne bi hev re tevgerîyane.

Hûn di derbarê têkilîyên navbera rêxistinên kurdan da çi difikirin?

*Knyazê Îbrahîm:* Gelek sedemên nakokî û berberîyên navbera yekeyên sîyasî yên kurd hene. Lê belê ji wan ku em sê heban derînin pêş, dê ne şaş be:

1. Berjewendîyên çînî û rêxistini yên rêxistinan hene. Nêzîkatîya wan a ku tirsa parastina xwe raserî berjewendîyên neteweyî digirin heye. Hemû avakarîyên sîyasî yên kurdan bandor girtine ji mercên xirab û timê xwe li hember “talûkeya mirinê” hîs kirine. Ji ber karekterên xwe yên çînî, bi wê tirsê jîyane ku derbe bixwin, ne tenê ji hêzên derve ji yên hundir jî. Ew kesên ku di bin talûkeya mirinê da dijî, dostên wan kêm û dijminê wan gelek in.

2. Çonayetîya parçeyê ku rêxistin lê peyda dibe û têkilîyên wê bi hêzên der va re ku hiştîye pê va girêdayî bimîne heye. Rêxistinên kurdan ew rêxistinên welatekî mêtîngeh in ku di navbera çar dewletan da hatîye parçekirin. Asta bandorbûna wan ji polîtîkayên dewletên ku lê peyda dibin û polîtîkaya hêzên derveyî ji wan dewletan re gelek cuda bûye. Dema ku em li dîroka rêxistinan dinêrin kevaleke wiha dertê pêşberî me:

Her rêxistin li hember dewleta lê peyda bûye di nava şer da ye û xwe dispêre dewleteke din. Ev weke nêçarîyek hatîye dîtin. Gelek rola dewletên mêtînger çêbûye ku rêxistinên kurd li hember hev rabin û bikevine nava şer. Dîsa di herêmê da berjewendîyên împeryalîzma klasîk û sosyalîst hebûye û wan jî bi polîtîkaya “parçe bike û bi rêva bibe”, kurdan tenê li hember dijmînên xwe ranekiriye, li hember hev jî rakiriye.

3. Kevneşopîya ku xwe dispêre parçeyan. Objektîf mercên peydabûnê hiştine ku kurd bi rengekî bi parçe bihizirin û tevbigerin. Di van 50-60 salên dawî da hinek rêxistinên Kurdistanî “Kurdistana Yekbûyî ” ji xwe re kirine armanc. Lê dema ku hûn li pratîkên wan rêxistinan dinêrin, hûn dibînin ku xwe rizgar nekirine ji wê çemka navenparêzîya ew parçeyê ku jê derketine. Bêguman, ev çemka navendparêzîyê bi gelek hincetên weke mercên herêmî û sîyasî va hatîye pêçan. Ger hûn hinek din herin kûrbûna wê, hûnê bibînin ku di bin vê mantiqê da ji daneyên zanistî zêdetir, psîkolojîya navendparêzîya eşîrî heye. Di navbera eşîrîya klasîk û nûjen da gelek alîyên dişibin hev hene. Rêxistinên herî nûjen ên Kurdistanê jî di wî halî da ne ku hê xwe rizgar nekirine ji şêwaza rêxistinkirina eşîretgerîya sîyasî.

Di bingeh da mijara têkilîyên navbera rêxistinên kurd, mijareke cidî ye ku divê ji alîyê akademîk û zanistî va bê lêkolînkirin. Di vê bingehê da hilkeftinên xebata zanistî pêk hatine û hene. Lê belê çi mixabîn e ku ne çonayetîya van xebatan têrî pêdivîya yekîtîyê kiriye û ne jî encamên zanistî derfet dîtine ku xwe bigihînin nîvenga sîyasî.

## DEWLETA FEDERE YA KURDISTANÊ DI VAN 60 SALÊN DAWÎ da BÛYERA HERÎ MEZIN A KURDAN E

*Hejarê Şamîl:* **Kurdan di sedsala 20an da pêvajoyeke gelek tevlîhev jîyan. Em bi hêvîyên mezin ketine sedsala 21ê. Ji hêla DYA’yê va derbeyeke kuştinê hat lêdan li wê statûkvoya sîyasî ku ji hêla hêzên navneteweyî va hatibû avakirin, di destpêka sedsala 20an li Rojhilata Navîn. Dîyar dibe ku hêzên Rojavayî bi xwe re pêdivî dîtine ku wê sîstema Rojhilata Navîn hilweşînin, ku berîya sedsalekê ji hêla wan va hatibû avakirin. Li Îraqê parçekirina statûkvoyê ji bo Başûrê Kurdistanê derfetê federasyon û dewletbûnê bi xwe re anîye û hiştîye ku gotina mîna “sedsala 21ê ya kurda ye” pêş bikeve. Gelo**

**divê mirov vê yekê bi rengê ku ev nirxandina peşveçûna sîyasî ya cîhanê ye an na bi rengê ku xwestekên me wisa dixwazin, bipejirîne?**

*Knyazê Îbrahîm:* Ji bo ku sedsala 21ê vegere sedsala kurdan û kurd bigihîjin wan mafên xwe yên ku ji zû da maf dikin, bi zêdetirî derfet derketine holê. Mesele ev derfet rast bikaranin e. Em nikarin qala wan bextewarîyan bikin ku weke xelat li stûyê me kirine. DYA ku îroyîn hêza sûper e, destek dide ku li Başûrê Kurdistanê dewleteke kurd bê avakirin. Ev fersendeke mezin e ji bo kurdan. Ger ew destwerdana der va nebana, birayên me yên Başûrî nikaribûn xwe bigihandana vê encamê. Heman rewş ji bo parçeyên dîtir jî derbas dibe. Ji bo ku kurd bigihîjin azadîya xwe dînamîkên hundirîn bingeh in, lê bele îro li Rojhilata Navîn ew mercên weke pêzdarez, psîkolojîyên civakî, kevneşopîyên sîyasi, çonayetîya têkilîya dewlet û gelan ku ava bûye, hiştine ku hetanî destwerdana der va pêk neyê, ji bo dema nêzîk ne mimkûn e ku li Rojhilata Navîn statûkvoya paşverû bê şikandin. Ev yek bi zelalî datîne holê ku ev pêk neyê di herêmê da sîstemên demokratîk ava nabin.

Dewletbûna li Başûrê Kurdistanê; çarenûsa gelê kurd ji binî va bandor kiriye û pêşketineke wisa dîrokî ye ku dê dehsalên pêş me dîyar bike. Dewleta Kurdistana Federe ku bûyera heri mezin a 60 salên dawî ye, divê bê parastin û pêşxistin. Divê hemû pîlanên xebatê yên sîyasi, çandî û civakî yên gelê kurd ku 45 mîlyon e, di xala yekemîn da cih bigire. Bawerîya min ewe ku ji vê mezintir peywîra pîroz a kurdê nûjen tuneye. Gava ku birayek mala xwe ava dike, birayên din alîkarî pê didin. Îro xerc, tuxle û hosteyên birayên Başûrî amade ye û temel hatîye avêtin. Birayên Bakûrî, Rojhilatî û Rojavayêbaşûrî ji bo ku avahî kamil bibe, divê şev û roj kevir rakin û xerca xwe tevlî bikin.

## KURD LI QAZAXISTANÊ XWEDÎ HER CÛRE MAFÎ NE

*Hejarê Şamîl:* **Birayek jî li dîasporayê ye.**

*Knyazê Îbrahîm:* Belê, belê. Di pirtûka te ya dawî da cihekî mezin hatibû veqetandin ji bo têza “parçeyê pêncemîn” (dikene). Weke ku dor hatê divê ez bibêjim, di 15’ê nîsanê da li Almatê em konferanseke zanistî-pratîk a navneteweyî bi navê “Gelê kurdê nûjen: rewşa heyî û perspektîf” li dar dixin û em pîlan dikin ku cih bidin van mijarên ku em bahs dikin. Ji ber vê çendê jî ez gazî rewşenbîr, zanyar, sîyasetvan û

rojnamevanên kurd dikim ku bi tez û dîtinên xwe destekê bidine konferansê.

*Hejarê Şamîl:* **Em li ser rewşa kurdên dîasporayê û weke şênberî jî li ser rewşa gelê me yê li Qazaxistanê nesekinîn. Min dît ku li Qazaxistanê ji bo pêşveçûna gelê me di warê civakî, çandî û perwerdeyî da nîvengeke erênî hatîye afirandin. Di salên derbasbûyî da li Qazaxistanê dersên zimanê kurdî dest pê kiribû, dewleta Tirkîyê ev yek protêsto kiribû. Qazaxistan ji wan protêstoyan bandor negirtibû û mafê perwerdedîtina zarokên kurdan paşçav nekiribû. Wisa tê fêmkirin ku ji rêgezên xwe yên demokratîk tawîz nedan.**

*Knyazê Îbrahîm:* Qazaxistan dewleteke serbixwe ye. Piştî hilweşîna Sovêtê serxwebûna xwe ragihand û paşê jî di warê aborî, civakî, çandî û sîyasî da leza pêşveçûneke cidî wergirt. Azadîyên sîyasî û demokratîkbûn, bi vê wateyê nasîn û sepandina mafên hindikahîyan, di van dehsalên dawî da pêşveçûnên cidî pêk hatine. Di welatê me da ji 100'an zêdetir hindikahîyên neteweyî-êtnîkî hene. Li hember mafên hindikahîyan rêzdarî, parastin û pêşvebirina ziman û çanda êtnîkî, di bin kontrola serokkomar Nûrsultan Nazarbayev da tê birêvebirin. Birêz serokkomar, bi xwe peywîra serektîya Yekîtîya Gelên Qazaxistanê hildaye ser xwe. Piştî hilweşîna Sovêtê tekane komar Qazaxistan e ku mînanî komarên din ên Sovêtê pevçûnên neteweyî û êtnîkî lê neqewimîne. Di welatê me da ku ji sedî zêdetir yekaneyên êtnîkî lê peyda ne, nîvenga xweşbînîyê ku hatîye afirandin û sîyaseta neteweyî ku tê meşandin weke mînak e ji bo wan welatên ku dibêjin me bi dehsalan xwe bi sîstema demokratîk bi rê va birîye.

Li Qazaxistanê ji bo pêşvebirina neteweyî û çandî ya kurdan ti asteng nînin. Berevajî, projeyên çandî û perwerdeyî ji hêla dewletê va destek dibînin. Li her devera ku kurd lê dijîn, di dibistanên bingehîn da dersên zimanê kurdî têne dayîn. Dîsa pirtûka min a bi navê "Zimanê kurdî" ku ji du cîldan pêk tê, ji hêla Wezareta Perwerdehî ya Qazaxistanê va hatîye qebûlkirin. Ev pirtûk ji bo komên 2-5 û 6-9 hatine amadekirin û di demeke nêzîk da dê bên çapkirin û li zarokên kurd bêne belavkirin. Em xwedî her cûre derfetên rêxistinbûnê ne. Weke hemwelatîyên wekhev derfetên me yên pêşveçûna aborî û civakî hene.

Bêguman gelek pirsgirêkên me di warê çandî, civakî û perwerdeyî da hene. Ev piranî bingehên xwe ji me digirin. Em dikarin bi hewldaneke mezintir çareser bikin.

## DOSTANÎ HÊZEKE MEZIN E

*Hejarê Şamîl:* **Apê Knyaz, sohbeteke dirêj bû ev. Gelek mijar hene ku ez dixwazim li ser rawestim, lê divê ez wan pirsên xwe bihêlim. Ez dixwazim ku hûn bi gotinên xwe dawî li axaftinê bînin...**

*Knyazê Îbrahîm:* Di sala 67'an da helbestvanê meyî mezin Evdirehman Hejar Mukrîyanî hatibû Êrîvanê. Ez pê re weke wergêr çûme Bakûyê. Rojekê ku em di kolanên Bakûyê da dimeşîyan ji minra wiha got: "Keko, dijminên me stemkar in. Maf û peywîra me ye ku em li hember wan têbikoşin û li ber xwe bidin. Lê belê ji bo rizgarîya gelê me, divê em bi gelên cîhanê re dostanîyan ava bikin." Ev gotin min hizirandibû. Lê belê min wê demê kûrbûna gotinên hostayê mezin Hejar baş fêm nekiribû.

Pêşveçûnên van deh salên dawî yên têknolojîyê cîhana me biçûk xistîye. Girîngîya mirovê sîyasî û heta ya têkilîya berjewendîyê bilind bû.

Ez ne di wê bawerîyê da me ku cîhan bi awayekî dijminî nêzîkî kurdan dibe. Ruh halîyekî wisa mirovan ber bi berxwedêrîyê va dişemitîne, lê belê nabe encamwergirtina dawî. Ger di bingeh da tu lê binêrî, qasî ku tu diafirînî dostên te hene û qasî diafirînî dijminên te hene. Derfetên me yên afirandina dostan û van ji bo rizgarîya gelê me dane şixulandin, îro ji her demê bêtir in. Weke yekî ku di hemû jîyana xwe da lêkolînên wêjeyî yên mijarên dostanîya navbera gelan hilkolaye ez bibêjim, bawerîya min heye ku emê hêza mezin a dostanîyê bixin bin xizmeta azadîyê.

Hejarê Şamil
Sala 2006
Almaati, Qazaxistan

# "LI SER REWŞENBÎRAN MUXALÎFÎ Û ALÎGIRÎ TÊ ÇESPANDIN"

## Hevpeyvîn bi Kînyazê Îbrahîm re



Hevpeyvîn bi Kinyazê Îbrahîm re, ku profesorê wêjeyê, akademîsyen û serekê Yekîtiya Kurdên Qazakistanê ye.

"Mirovê xwedî hizir, gava ku ji rêxistinekê re bi temamî dibêje "erê" dibe propagandavanê wê û gava ku bi temamî wê rêxistinê xirab dike, dibe dijberê wê. Divê em hêzan bi rengê xirab û qencan hilnedin dest. Ji ber ku weke ku di navbera mirovan de yên bi temamî qenc an jî xirab tun in, di rêxistinan de jî, tun in. Her kes bi livandinên xwe carna pêş dixin û carna jî paşve dixin û her wiha xwedî pratîk û polîtîkayê ne. Hebûn na, livandinên mirovan dikare bibe mijara rexneyan.

Li ser rewşenbîran timî muxalîfî û alîgirî tê çespandin. Bi ya min e ku muxalîfiya rewşenbîr bi wateya sekna serbixwe bê pejirandin. Ew muxalîfiya siyasî û alîgiriya siyasî ku tê çespandin, bi îtîbara xweseriyê ne cuda ne. Lê belê ew ronahîbûna ku tu destnîşan dikî, ew ronahî ye ku, raserê bergeha siyasetê ye.

Divê rewşenbîr, di hemû qadên jiyanê yên weke civakî, siyasî, wêjeyî, çandî û hwd. de muxalîfiya xwe ya ramanî nîşan bide. Lê belê muxalîfiya rewşenbîr, divê bi şertê afirandinêriyê ve girêdayî be. Rewşenbîr tenê bi rexne na, bêtir jî bi afirandinê ve serbar e. Rexneya wî veşartî ye, di qenctirînê de, di rastînê de û di xweşiktirînê de. Ev çemka rewşenbîriyê dikare rewşenbîr bide rûniştandin, di jiyana civakî ya layiq de."

### Kinyazê Îbrahîm

Zanyarê rojhilat, kurdnas, rexnegirê wêjeyê, wergêr, doqtorê zanistên fîlologiyê, profesor, akademîsyenê Akademiya Zanistên Dibistanên Bilind ên Navneteweyî û Akademiya Zanistên Civakî ya Qazakistanê û serekê Yekîtiya Kurdên Qazakistanê.

Di 1'ê Gulana 1947'an de li Ermenistanê ji dayik bûye.

Kinyazê Îbrahîm (Mîrzoyev) salên dirêj di Ûnîversîteya Dewleta Ermenistanê de serekiya ziman û wêjeya Azerbaycanê kiriye. Di dawiya şerê azerî û ermeniyan de koçê Qazakistanê kiriye. Niha di Ûnîversîteya Abay a dewletê li Almatê serekê navenda zimanên cîhanê ye.

Kinyazê Îbrahîm li bajarên weke Parîs, Berlîn, Bruksel û hwd. de endamê desteyên zanistê yên enstîtû û ûnîversîteyan e. Li bajarên weke Almatê, Moskov, Sankt-Petersburg, Tiflîs, Parîs, Berlîn, Amsterdam ve Bruksel beşdarî konferansên zanistî û teorîk bûye.

K. Îbrahîm, bûye endamê yekîtiya nivîskarên YKSS, serekê şûbeya Azerbaycanê ya yekîtiya nivîskarên Ermenistanê û redaktoriya kovara "Edebî Ermenistan". Niha jî endamê yekîtiya nivîskarên Qazakistanê, endamê yekîtiya rojnamevanên Qazakistanê û endamê Pena Kurd e. Her wiha seredîtorê kovara "Nûbar" e ku, li Almatê dertê û nivîsên zimanê kurdî, rûsî û qazaxî tê de peyda dibin.

K. Îbrahîm di jiyana civakî û siyasî ya kurdên Sovyet û Qazakistanê de xwedî roleke aktîf e. Endamê Parlementoya Kurdistanê ya li Surgunê ye. Dîsa di sala 1991'ê de bûye serekê kurdên YKSS'yê. Her wiha cîgirê serekê Yekîtiya Komeleyên Kurd ên Navneteweyî ye.

Pirtûka wî ya dawî "Ansîklopediya Kurd a Biçûk" hatiye wergerandin ji bo zimanên rûsî, îngilîzî û qazaxî. Dîsa heman pirtûk tê wergerandin ji bo zimanê holendî û tirkî.

Di sala 1998'an de ji ber xizmeta xwe ya di warê hîndekarî û jiyana civakî de, ji hêla Komara Qazakistanê ve madalyona "Rêzdariyê" wergirtiye.

Zimanên weke kurdî, azerî, rûsî, ermenî, farisî, tirkî, qazaxî û ozbekî dizane.

Bi akademîsyen Kinyaz Îbrahîm Mîrzoyev re di meha sibata 2006'an de, li bajarê Almata Qazakistanê, min ev roportaj pêk anî. Min destpêkê beriya 11 salan gotinên ku di navbera me de derbas bûbûn anî bîra wî:

## ME ŞERÊ NAVXWEYÎ DI SEDSALA 20. DE HIŞT

**Hejarê Şamil:** Mamoste Kinyaz, di sala1995'an de min tu di dema "Konferansa Kurdên CDS" de li wê hotêla ku tu lê dimayî de ziyaret kiribû. Di wê pêvajoyê de di navbera rêxistinên kurdan de şer hebû. Çendî ku me nexwestebû jî bingehê sohbeta me bûbû ew mijar. Min wê demê aliyê hêzekî girtibû ku, di nava şer debû. We bi sebreke mezin gotinên min ên tijî peyvên propagandayê guhdarî kiribû û van gotinên hanê rêz kiribû, ku minê ti carî ji bîr nekiriba:

"Birazî, ez hestên te fam dikim. Çi gumana min ji jidilbûna te nîn e. Lê belê zimanê rastînan ne weke zimanê hestan e. Du kurd li hember hev çek radikin û heke kurdê sêyem ranabe û vî şerî nade rawestandin, ew dibe hevparê vî sûcî. Her wiha di vî şerî de em tev sûcdar in. Dema ku kurd bi rengekî rêxistinkirî li hember hev çek bi kar bînin, ew dibe trajediya neteweyî. Alî girtin, ne ew nêzîkatî ye ku trajediyê ji holê rabike. Ger alîgirtin pêwîst bike, divê ew bibe aligirtina yekîtî, yekbûnî û aştiya navbera kurdan. Ew kesê ku ji xwe re dibêje ez rewşenbîr im, nikare ji bilî vê bibe xwediyê sekneke din. Ger sekneke din li ser xwe pêk bîne, hingê dê bi benzîne bazde ser êgir. Hemû rêzanên kurdan destnîşan kirine ku, bingehîn sedemê facîaya dîrokî ya ku gelê me dije, şerê navxweyî ye. Yek ji van ê ku vê rewşê baş pênase kiriye Ehmedê Xanî ye. Beriya çarsedsalan wiha gotiye, ger kurd bûbûna yekîtî, dê serî bitewandana rûm û ecem.

Ger em Ehmedê Xanî weke kesayetekî kurd ê bilind bihesibînin, divê em qiymet û hêjayî bidine ramana wî. Divê pevçûn û şer di nav kurdan de hestên alîgirtinê na, hestên şermê bide avakirin.

Lê belê dinya diguhere, kurd jî bi wê dinya ku diguhere re, divê ji nû ve vegerin û li xwe mêze bikin. Ew pevçûnên bixwîn ên navbera kurdan ne çarenûs e. Bi ya min dê gelê me wan pevçûnên di sedsala 20. de bihêle û wisa bikeve sedsala 21.!"

Çendî ku wê demê ji van gotinên we bibandor bûbûm jî, min wê baweriya xwe ya ku min digot rast e û aliyê "yê ku mafdar e" girtibû. Lê ji ber ku li hember we rêzdariya min hebû, min pêwîstî neditibû bi xwe re ku we bibersivînim.

Niha em di 6 saliya sedsala 21. de ne. Ew pevçûnên di navber rêxistinên kurdan de di dawiya sedsalê de xwe nîşan dabûn. Ji bilî bûyerên kuştinê yên ku di navbera rêxistinan de qewimîbûn, çek di dest de em pev naçin. Ew lîderên kurdan ku her yek ji wan aliyekî şer bû, ragihandinên mînanî "ji niha û pê ve dê kurd li hember hev çekê ranekin" ku dilê mirov xweş dike bi lêv dikin. Pratîkên ku têne sepandin van ragihandinan piştrast dikin. Hizra min ew e ku, di navbera kurdan de pevçûnên rêxistinkirî qediyane. Gelê me dê careke din destûr nede van trajediyên wiha neteweyî.

We beriya deh salan weke pêxemberekî gotibû "Dê gelê me wan pevçûnên di sedsala 20. de bihêle û wisa bikeve sedsala 21." û ez ji ber vê pêşbîniyê we pîroz dikim. Ger ku hûn di vê pîrozkirina derengmayî de qisûrekê nebînin...

**Kinyazê Îbrahîm:** Piştî ku Yekîtiya Sovyetê hilweşiya, eşkere bû ku rastiya kurd a ku di bin siya bîrdoziya bloka sosyalîst de bîçim girtibû bi pêvajoyê re rengê xwe biguhere. Rewşa objektîf, rengê veguherîna cîhanê û faktorên konjûktûrel vê nîşan didan. Mercên sûbjektîf ên derveyîn û hundirîn, tenê dikaribûn leza projeya veguherînê kêm bikin an jî zêde bikin. Bi konjûktûra navneteweyî ya ku piştî salên 1990'î tevgerên azadiya kurd fersendê peyda kirin ku pratîk û pêvajoyên xwe yên pêşveçûnê bi rengekî kûr di ber çavan re derbas bikin. Ev fersendên çonayetiyê weke rêpîvanekê di wan pêvajoyên serûbinbûnê de rû didin. Kurd giran ketin di karê xwe gihandina pêvajoyê de, lê bê tevger jî

neman.

Cîhana du cemserî ji aliyê bandora faktorên derveyîn ve guncav bû ku, bêahengiyekê biqewimîne di şûngehê siyasî yê kurd û nakokiyên navbera kurdan de. Yek jî, berevajiyê weke ku dihate payîn, Sovyet ku ti carî tevkarî nekirine ji bo pirsa kurdî, çi projeyeke wan tunebû û nebû ku xwestekên azadiya siyasî ku bi rengê serxwebûn, federasyon ango otonomiyê dihatine formûlekirin. Yekîtiya Sovyetê weke faktorê alîkar nihêrtiye li pirsa kurdî di polîtîkayên Tirkiye, Îran, Îraq û Suriyê de. Faktora kurd, ji aliyê Sovyetê ve di taybetî de ji bo wan dewletan, di giştî de jî bandor û destwerdana li ser Rojhilata Navîn bû. Û projeyeke Sovyetan tune bû ku, kurdan di Rojhilata Navîn de bîne rewşeke bandordar û statûkoyên heyî biguherîne. "Navenda vebûna cîhana ereb, Îraqa dost ku li hember împeryalîzmê serî radike", "Meyildarê sosyalîst, Suriya dijberê împeryalîst", "Ji aliyê jiopolît û aborî ve Îrana dost ku dijminê împeryalîzmê ye" û "Tevî ku di eniya împeryalîst de ye Tirkiyeya bêxisar" Sovyetan nerihet nedikir, bi gotineke rastir, bi gor berjewendiyên rêveberiya Moskovê bû. Bi taybetî piştî salên 70'yî ew baweriya îdeologên sosyalîst ku digotin emê şoreşa sosyalîst li tevahî cîhanê belav bikin rahejiyabû. Berevajî ev rewşa ku li Sovyetê dihate dîtin, hêviyên kurdan ji YKSS bibingeh bûn. Bloka kapîtalîst ku kurd bi rengekî bêbawerî nêzîkê wan dibûn, ji ber hevsenga Sovyetê xwe nedidane ber ku li Rojhilata Navîn guhertineke rehdar pêk were. Berevajiyê vê jî rast bû. Sovyetên ku cîhanê bi kapîtalîstan re parve kiribûn, pêmen bûn ji wê hewes û hêza xirabkariya hevsengê. Di dawiya salên 70'yî de YKSS destwerdana Afganistanê kir û tê de asê ma. Ev yek hişt ku hemû hewesa Sovyetê ya belavbûnê bişikê. Ew gel û civatên ku li Rojhilata Navîn di rêkên cuda de têkoşîna xwe didan, hêza wan tunebû ku wê statûya li dijî gelan hatiye avakirin bişikînin.

Mixabîn, manevrayên ku kurdan di navbera herdû sîsteman de bi rengekî neçarî pêk anîn, wan nebir encamên rehdar. Tenê dihişt ku rojên xwe bi têkoşînê felat bikin. Kurd di navbera sîstem û dewletan de erçiqandî mabûn û bûbûne mehkûm ku di navbera xwe de jî wê polîtîkaya kevneşopî ya şerê navxweyî bidomînin. Ew dewlet û hêzên mêtînger ên sereke ku di hundirê herdu sîsteman de cih girtibûn, kurdan bi rengekî stemkar bi kar dianîn. Hilweşîna Sovyetan dê guherînên bingehîn anîbana ji bo kurdan. Dê fersendan afirandibaya ji bo çareseriya pirsa kurd.

Şerê navxweyî, weke rastiyekê encamê bêçareseriyê bûn. Navekî din ê xilasbûna şerê navxweyî, ber bi çareseriya pirsa kurd ve çûyîn e. Bi hilweşîna Sovyetê re dihate dîtin ku dê pirsa kurd bi vî an jî bi wî şiklî bikeve riya çareseriyê. Bi mantiqekî wiha divê neyê hizirandin ku li pêşiya pirsa kurd astengê bingehîn Yekîtiya Sovyetê heye. Mebest ew e ku, sîstema du cemser û asta nakokiya di navbera wan de, hiştibû ku ev pirs were halê bêçareseriyê.

## EM JI QONAXA BELAVKIRINÊ DIGIHÊN QONAXA AVAKIRINÊ

**H.Ş:** Profesor, hûn baweriya xwe ya beriya 11 salan diparêzin? Şerê navxweyî yê kurdan, gelo li paş ma? Gelo arezûya mezin ya Ehmedê Xanî dikeve qonaxa pêkhatinê?

**K. Î:** Bê guman diparêzim. Dilşa me. Vekolîna nîvenga siyasî, civakî û aborî ya li Kurdistanê ava bûye, derfet dide ku em baştirîn karibin xwe bigihînin pêşbîniyên pêşerojê. Di panoramaya Kurdistanê de xetên hêvî diafirînin zêde ne. Parametreyên hizra me tên guhertin. Em ji qonaxa belavkirinê digihên qonaxa avakirinê.

**H.Ş:** Ger ez îro bi profesorekî wêjeyê re, ku di mijarên ziman û wêjeyê de bûye layiqê navdariya akademîk du û dirêj ser sîyasetê gotûbêj dikim, ne ji xwesteka min tê, ji ber neçariyê ye. Bavê min ê xwedê rehma xwe lê bike timî digot: "Te peyva kurd bi kar anî, ji wê gavê pê ve tu siyasetê dikî." Bi rastî jî wisa ye. Kurdê bêdewlet, ziman, çand û hemû hebûniya wê ya neteweyî ku di bin zextê de ye, em mafên siyasî û çandî deynin wî alî, çîroka wî ya ku vegotina wê çêlekê dike û ketiye bostanê cînar, weke siyasî tê fêmkirin. Ev jî nakokiya çarenûsê ye. Hûn weke profesorekî ziman û wêjeyê, ku hemû jiyana xwe daye ser riya dostaniya wêje û gelan, li gelşa têkiliya kurd û siyasetê çawa dinêrin? Ez bi xwe di wê gumanê de me, ku siyaseta kurd tenê ji aliyê ew kesên ku navê wan siyasetmedar e tê meşandin.

**K.Î:** Şamîl Esgerov, rehma xwedê lê be, ew kesayet e ku gelek xizmet daye gel û kurdekî ansîklopedîk e. Mirov nikare tenê peyveke wî jî bavêje der.

Tevî ku Ehmedê Xanî û Cegerxwîn temsîlkarên bêhempa yên giyana gelê kurd in, ramana siyasî ya kurd anîne ziman, xistine sîstem û bi zimanekî lîrîk vegotine. Ma siyaset, ne ew hunerê parastina berjewendiyên wê civata ku tu xwemalê wî yî? Dibe ku Ehmedê Xanî siyaseta pratîk nekiribe, lê belê di formulekirina ramana siyasî ya kurd de, di sefandinê de xizmeta bêhempa daye. Cegerxwîn ew helbestvan e ku, bi jîrekatiya lîrîk û siyasî girseyan rakiriye ser piyan. Hunermendê hemçerxê me Şivan Perwer, di livandina dînamîkên civaka kurd de qasî serokê rêxistinekê xizmet kiriye. Têkiliya wêje û hunerê bi rengekî neyekser bi siyasetê re heye.

## EZÊ TIRKIYÊ BIDIME DADGEHA MAFÊN MIROVAN A EWROPA

**H.Ş:** Hûn bi tirkî baş dizanin. Hûn li Qazakistanê ji bo zarokên tirk programên dersê amade dikin. Bi gotina akademisyenekî qazax, "bavîtiya zarokên tirk" dikin. Salên dirêj di ûnîversiteya dewletê ya

Erîvanê de, hûn bûn dekanê fakûlteya ziman û wêjeya Azerbaycanê. Bi sedhezaran azerî li Ermenistanê dijiyan û tenê yek fakûlteya azerî hebû. Bi gotina akademisyen Nadir Nadirov "kurd bû kurd jiya" ku kurdekî li wê fakulteyê dekantî dikir, ev yek tiştekî mezin bû. Niha mijara me ne ev e. Ez dixwazim mijarê bînim bûyereke dawî. Kinyazê Îbrahîm, ku jiyana xwe daye ber riya dostaniya gelan û derheqa dostaniya gelên kurd û azerî de berheman afirandiye, li balefirgeha Stenbolê nehiştin ku bikeve hundir. Bi "fermana wezîrê karê derve" hûn hatine zivirandin ji bo Almatê. Divê ev yek çawa bê ravekirin? Dibe ku ez hesta we ya baweriya kûr a biratiya gelan biêşînim lê belê, ku ez van gotinan nebêjim ezê hedar nekim: "Tirk ji ber ku kurdan weke gel nahesibînin û ew kesên ku ji xwe re dibêjin em kurd in weke mirov nabînin, xebata we ya bi navê dostaniya wêje û gelên kurd û tirk ji bo xwe weke heqaret hesibandine û ji ber vê sedemê hûn nexistine hundirê welatê xwe."

**K.Î:** Di 19 îlona 2005'an de demeke dirêj ez li balafirgeha navneteweyî ya Stenbolê dame sekinandin û paşê hatime zivirandin. Ev bûyereke wisa ye ku ji her şiroveyê re vekirî ye. Welatekî ku dibêje ez demokrat im û pî dikole li ber deriyê Yekîtiya Ewropayê, bêyî ti sedem nîşan bide û helwestekî wisa nîşan bide, di serî de piştrast dike ku bi wan rêgezên ku pejirandiye re nakokiyeke rişt jiyan dike.

Ez hatibûme dawetkirin ji bo dîroka 21-25 Îlona 2005'an ji hêla Dewleta Federe ya Kurdistanê, ku dê festîvala çanda kurd a navneteweyî pêk bihata. Ji bo ku li ser Tirkiyê derbasî Kurdistanê bibim çûbûm Stenbolê. Piştî ku demeke dirêj li wir hatime sekinandin, ji min re gotin ku dê min bizivirînin Almatê. Min ji wan memûran re got "Ez zanyar im, ne terorîst im. Mafê we tune ye ku hûn min paşve bizivirînin". Memûrekî payebilind wiha got: "Lê belê ferqa we kêm e. Mamoste, hûn jî bi pênûsa xwe cihêxwaziyê dikin!" Ez hê jî nikarim fêm bikim ku çawa mamûrekî payebilind yê Tirk dikare li hemwelatiyekî Qazakistanê heqareteke wiha bike. Tirkiye bi zivirandina min, him zagonên xwe û him jî zagona mafê gerîna navneteweyî binpê kiriye. Ji sedemê vê bûyerê, ez amadekariya xwe dikim ku di dadgeha mafên mirovan a Ewropayê de li hember komara Tirkiyê doz vebikim.

## EM DIBIN "TEWANBARIYA NE JI ME" DE NE

**H.Ş:** Ev gotinên we dihêlin ku wan xisûsên min negirtibû rojeva xwe destnîşan bikim. Dibe ku hatibe guhê we jî. Min di derbarê we de gelek gotûgotên rêxistinkirî bihîst. Demekê hinek derdoran ji bo we digotin "zilamê ermeniyan". Di sala 1989'an de bi deh hezaran kurdan re hûn ji wî welatî hatine derxistin. Paşê gotin "zilamê azeriyan". Di nivîsên ku di derbarê we de di çapemeniya Azerbaycanê de derketine diyar dibe ku hûn weke "non grant" (zilamê nayê xwestin) hatine ragihandin. Di van salên dawî de jî hûn bûn "zilamê tirkan". Lê hûn jî amadekariyên xwe dikin ku di derbarê Tirkiyê de doz vebikin...

**K.Î:** Birazî, çi kêmanî û zêdayiya gelan ji hev nîn e. Dostanî û biratiya gelan jî ne têgehên razber in. Dostaniya gelekî bi yê din re, bi dostaniya wan kesên din pêk tê. Bi sedan dostên min ên azerî, ermenî, tirk, qazax û rûs hene. Em bi hizra ku emê tevkariyê ji bo gelên xwe bikin nebûne dost. Têkiliyên normal yên mirovanî yên di navbera du mirovan de xwe gihandin dostaniyê. Lê belê heke me nasnameya xwe ya etnîk biçûk dîtibaya, bi misogerî meyê nikarîbûya dostaniyê ava bikira. Ji ber ku ermenî û azerî û tirk qirên dikin, ez nikarim pişta xwe vegerim dostê xwe yê ermenî yan jî yê din. Felsefeya min a jiyanê ev e. Qasî kurdan ji gelên din jî dostên min hene. Lê belê ez kurd hatime dinê, kurd jiyam û ezê weke kurdekî bimirim. Ew gotûgotên ku di derbarê min de belav bûn jî, kare wan kesan e ku, dev ji neteweyên din berde, bi mirovên xwe re jî nikarin têkiliyeke mirovanî deynin. Karê wan kesê ji xwe aciz e ku ji bo gele xwe nikarin kevirekî deynin ser hev.

Beriya çend salan ji bo daîreyên dewleta Qazakistanê di derbarê min de gelek nameyên gilîkirinê hatibûne nivîsandin. Di nameyekê de dihate nivîsîn ku ez bi dewleta Tirk re di nav têkiliyan de me û li mala min wêneyê Atatirk heye û di paragrafa din de jî dihate gotin ku ez endamê rêxistina PKK'yê me...

Di sala 1995'an de di rojnameyeke tirk a mezin de dihate nivîsîn ku ez sereke navenda kurd a virê me û bi rengê "PKK li Qazakistanê" manşet vekiribû. Jixwe mantiqa wan kesên nexweşê giyanê wisa ye.

Jiyana rewşenbîrekî kurd ku ramana azad diparêzê û şêwaza livandina serbixwe bingeh digire bi zehmetî û zoriyên mezin derbas bûye. Bi îdîaya ku nêzîkê hêzekê yî, ji aliyê hêza din ve têyî tewanbarkirin. Rewşa min balkêştir e. Min sekneke serbixwe esas girtiye û min tim xwestiye ku bi her kesî re di heman dûrbûnê de bim. Tevî ku kes wêrekî bi xwe re nabîne û li hember min nabêje jî, ji paş ve ji aliyê gelek kesan ve hatime tewanbarkirin. Ez ji bo vê dibêjim, "tewanbariya ew kesên ne ji me ne!" A herî bijan ew e ku, tu ji hêla wan kesan ve têyî tewanbarkirin ku te ji bo wan 40 salî xizmet daye û hemnijadê te ne...

## DIVÊ HEBÛNA RÊXISTINAN NA, KIRYARÊN WAN BÊ REXNEKIRIN

**H.Ş:** "Alîgirtin" mijareke sotîner e. Divê rewşenbîrek bibe alî an na? "Alînegirtin" bi min re wateyeke dîtbarî dide çêkirin. Ji aliyê din ve ew rewşenbîrên ku di mijarên wêjeyî, çandî, hunerî û siyasî de ked dirijînin "alîgirtin"a wan bi wateya rast a gotinê siyekê dadixe ser rewşenbîriyê. Ji

ber ku bingehîn mercê rewşenbîrbûnê bi pijdana ramanê ber bi muxalîfiyê ve çûyîn e. Bi vê wateyê "alînegirtin"a wî qasî ku wî bîne rewşa "dijber" tûj dibe.

Ev pênaseya wê "tewanbarkirina ew kesên ne ji me" li xweşa min hat. Ji ber bandorî û sekna rewşenbîran, ku timî zorê li ser wan tê kirin ji bo ku bibin alî, tiştekî xwezayî ye. We got, "min tim xwestiye ku ji her kesî re di heman dûrbûnê de bim". Gelo di heman dûrbûnê de mayîn dibe raderbirîna pratîka rast a rewşenbîrên rast?

**K.Î:** Wekhevî û di heman dûrbûnê de mayîn sekneke nispî ye. Ji ber ku tu nikarî wê dûrbûna di navbera xwe û kes, hêz û ramanên cuda de bipivî. Di vir de mijara gotinê çemk e. Mînak, em gelşê têkiliya bi rêxistinên kurd ve hildin dest. Di pêvajoyên cuda cuda de ji ber raman û pratîkê xwe nêzîkê yekê dibî. Bi rêxistina din re bi rengekî xuyayî dûrbûnek pêk tê. Ev, ew pêvajo, polîtîkayên ku ji hêla rêxistinê ve têne birêvebirin û pozîsyona ku tê de peyda dibin re eleqedar e. A ku diyarker e ev e. Lê belê ji bo rewşenbîrekî, bi rêxistinê re weke dîtbarî nêzîkbûn, bi rêxistinên din re jî dûrbûn, vêca wateyeke bi rengekî ku tu dibî berevajiyê wan, dibî dijberê wan bi xwe re nayine. Divê wisa neyê fêmkirin jî.

Rewşenbîrê kurd ne xwedî wê lûksê ye ku, nêzîkatiyên bîrdozî, siyasî û pratîk ên rêxistinekê yekser bipejirîne û bikeve rewşa propagandavanê wê. Di dîroka mirovatiyê de kesek nîn e ku, bi propagandavaniya sîstemê xwe gihandiye navdariyê. Rewşenbîrê mezin Mîxayil Şolohov propagandaya partiya komûnîst a YKSS kiriye, lê belê yê ku ew kiriye rewşenbîr ne propaganda ye, hostatiya hunerî ya mezin û giyana wî ya serbixwe ye, ku xwe teyisandiye ramanên wî yên muxalîf. Tu dizanî, Şolohov di Sovyetê de yekem nivîskar e ku, di saxiya xwe de xelata Nobelê wergirtiye.

Mirovê hizirvan, ku rêxistinekê re bi temamî bêje erê dibe propagandevanê wê, ku bi temamî jî bêje na dibe dijberê wê. A baş ew e ku, divê mirov hêzan bi gora qenc û xiraban parve neke. Çawa ku di nav mirovan de nîn e, di nav rêxistinan de jî qenc û xirabên mitlaq peyda nabin. Lê belê livbaziya ku pêşve dibe û ya paşve dibe heye. Polîtîka û pratîkên wisa hene. Divê hebûnî na, livandinên wan bên pesindan û ji bo rastkirinê bên rexnekirin.

## A KU REWŞENBÎR AFIRANDIYE Û YA HERÎ BAŞ E, RAST E Û XWEŞIK E, REXNEYA WÎ YE

**H.Ş:** Çi mixabîn e ku rewşenbîrên kurd ên bi sekna Şoloxov di roja îroyîn de mûstesna ne. A rastî di Sovyeta berê de Şoloxovê ku xwedî ramana rewşenbiriyê bû bi wateya helwestê ne xwedî zêde hevalan bû. Rewşenbîrên kurd, bi wateya ku helwesta muxalîfiyê ku ev bingehîn mercê rewşenbîriyê ye şûna ku raxin, -ezê bi gotineke pir nerm bibêjim-"ji ber gelek şayişên jiyanî û siyasî bi tilarî tevdigerin". Rewşenbîrên kurd derfetên huner û wêjeyê ku raserî bîrdoziyê ye, di pîvaneke têr de nikarin bi kar bînin. Ev yek jî dihêle ku, di jiyana civakî ya gelê me de şûna ku bibin rêber, zêdetir dibine paşajo. Hûn bi giştî rewşenbîrên kurd ên îroyîn çawa dibînin?

**K.Î:** Ger em pîvanên îdeal xêz bikin û di nav de li rewşenbîr bigerin, em hingê nikarin xwe bigihînin nêzîkatiyeke rasyonel. Di sedsalan de carekê Ehmedê Xanî'yek dertê. Ew kevirên bingehîn in...

Ez hêvîdar im ku, dema em dibêjin helwesta mûxalîfiyê, tu wê danexî tenê nav sînorên helwesta mûxalîfiya siyasî. Li ser rewşenbîran timî tê çespandin ku wî têkine mûxalîfê siyasî û bibe aliyek. Bi ya min divê muxalîfiya rewşenbîr bi rengê sekna wî ya serbixwe bê fêmkirin. Mûxalîfiya siyasî ya ku tê çespandin, bi xweseriya xwe ji alîgirtina siyasî cuda nîn e. Lê belê ew rewşenbîrê ku te destnîşan kir, ew xwedî bergeheke raserî siyasetê ye.

Divê rewşenbîr di hemû qadên jiyanê de; civakî, siyasî, wêjeyî, çandî... de mûxalîfiya ramanî nîşan bide. Lê belê mûxalîfiya rewşenbîr bi afirandinê ve mercdar e. Rewşenbîr tenê bi rexnekirinê re na, zêdetir jî bi afirandinê re peywirdar e. Rexne û afirandina wî di ya herî qenc, rast û xweşik de veşartî ye. Ger çemka muxalîfiyê wisa be, wê demê dikare di nav jiyana civakî de li wî ciyê layiq xwe bide rûniştandin.

## TÊKILIYÊN NAVBERA RÊXISTINAN MIJARA LÊKOLÎNA ZANISTÎ Û AKADEMÎK E

**H.Ş.:** Dema ku mirov qala têkiliya rewşenbîr û rêxistinê dike, mijareke birîndar tê hişê mirov. Têkiliya navbera rêxistinan. Dibe ku hûn zêde li ser ranewestiyabin û ev mijareke derveyî warê lêkolîna zanistî be. Lê belê weke kesayetekî ku vekolîna dîroka Kurdistanê pêk aniye û nîvenga civakî ya rojaneyî dişopîne ramanên we girîng dibînim. Weke dîtbarî ez bibêjim: Kengê ku Kurdistan bû du parçe û hetanî sedsala 20. di nav kurdan de binkeya civakî ya herî rêxistinkirî eşîr bûn. Paşê bi bingehê eşîriyê bi karektera çînayetiyê rêxistin derketin. Tecrûbeya van 50 salên dawî, ku têkoşîna rêxistinên kurdan bi rengê neteweyî, rastîneke gelek sotîner deraniye holê. Têkiliyên navbera rêxistinên kurd, ji aliyê yekbûnê ve ji têkiliyên eşîrî şûndetir dimîne. Em nebûne nasdar ku ne di parçeyekî de û ne jî li seranserê Kurdistanê ew rêxistinên nûjen rabin û polîtîkayên hevpar ava bikin, bi demdirêji bi hev re tevbigerin. (Piştî destwerdana Îraqê sereke rêxistinên Başûr ji ber zexta DYA û sûdwergirtina konjûktûrel, weke neçariyekê ketine nav hewldanên avakirina polîtîkayên hevpar). Lê belê di dîroka me de tevî ku eşîran şerên pir bixwînî li dar xistinê jî, li



kêleka vê rastînê li hember ew tiştên ku weke dijmin nasîne bi hev re tevgeriyane.

Hûn di derbarê têkiliyên navbera rêxistinên kurd de çi difikirin?

**K.Î:** Gelek sedemên nakokî û berberiyên navbera yekeyên siyasî yên kurd hene. Lê belê ji wan ku em sê heban derînin pêş, dê ne şaş be:

1. Berjewendiyên çînî û rêxistini yên rêxistinan hene. Nêzîkatiya wan a ku tirsa parastina xwe raserî berjewendiyên neteweyî digirin heye. Hemû avakariyên siyasî yên kurd, bandor girtine ji mercên xirab û timî xwe li hember "talûkeya mirinê" hîs kirine. Ji ber karekterên xwe yên çînî, bi wê tirsê jiyane ku derbe bixwin, ne tenê ji hêzên derve ji yên hundir jî. Ew kesên ku di bin talûkeya mirinê de dije, dostên wan kêm û dijminê wan gelek in.

2. Çonayetiya parçeyê ku rêxistin lê peyda dibe û têkiliyên wê bi hêzên derve re ku hiştiye pê ve girêdayî bimîne heye. Rêxistinên kurdan, ew rêxistinên welatekî mêtîngeh in ku di navbera çar dewletan de hatiye parçekirin. Asta bandorbûna wan ji polîtîkayên dewletên ku lê peyda dibin û polîtîkaya hêzên derveyî ji wan dewletan re gelek cuda bûye. Dema ku em li dîroka rêxistinan dinêrin kevaleke wiha dertê pêşberî me: Her rêxistin li hember dewleta lê peyda bûye di nava şer de ye û xwe disipêre dewleteke din. Ev weke nêçariyek hatiye dîtin. Gelek rola dewletên mêtînger çêbûye ku rêxistinên kurd li hember hev rabin û bikevine nava şer. Dîsa di herêmê de berjewendiyên împeryalîzma klasîk û sosyalîst hebûye û wan jî bi polîtîkaya "parçe bike û bi rê ve bibe" kurdan tenê li hember dijminên xwe ranekiriye, li hember hev jî rakiriye.

3. Kevneşopiya ku xwe disipêre parçeyan. Objektîf mercên peydabûnê hiştine ku kurd bi rengekî biparçe bihizirin û tevbigerin. Di van 50-60 salên dawî hinek rêxistinên Kurdistanî "Kurdistana Yekbûyî " ji xwe re kirine armanc. Lê dema ku hûn li pratîkên wan rêxistinan dinêrin, hûn dibînin ku xwe rizgar nekirine ji wê çemka navenparêziya ew parçeyê ku jê derketine. Bêguman, ev çemka navendparêziyê bi gelek hincetên weke mercên herêmî û siyasî ve hatiye pêçan. Ger hûn hinek din herin kûrbûna wê, hûnê bibînin ku di bin vê mantiqê de ji daneyên zanistî zêdetir, psîkolojiya navendparêziya eşîrî heye. Di navbera eşîriya klasîk û nûjen de gelek aliyên dişibin hev hene. Rêxistinên herî nûjen ên Kurdistanê jî di wî halî de ne ku, hê xwe rizgar nekirine ji şêwaza rêxistinkirina eşîretgeriya siyasî.

Di bingeh de mijara têkiliyên navbera rêxistinên kurd, mijareke cidî ye ku divê ji aliyê akademîk û zanistî ve bê lêkolînkirin. Di vî bingehî de hilkeftinên xebata zanistî pêk hatine û hene. Lê belê çi mixabîn e ku, ne çonayetiya van xe batan têrî pêdiviya yekîtiyê kiriye û ne jî encamên zanistî derfet dîtine ku xwe bigihînin nîvenga siyasî.

## DEWLETA FEDERE YA KURDISTANÊ DI VAN 60 SALÊN DAWÎ DE BÛYERA HERÎ MEZIN A KURDAN E

**H.Ş:** Kurdan di sedsala 20. de pêvajoyeke gelek tevlîhev jiyan. Em bi hêviyên mezin ketine sedsala 21. Ji hêla DYA'yê ve derbeyeke kuştinê hat lêdan li wê statûkayo siyasî ku ji hêla hêzên navneteweyî ve hatibû avakirin, di destpêka sedsala 20. li Rojhilata Navîn. Diyar dibe ku hêzên Rojavayî bi xwe re pêdivî dîtine ku wê sîstema Rojhilata Navîn hilweşînin, ku beriye sedsalekê ji hêla wan ve hatibû avakirin. Li Îraqê parçekirina statûkoyê ji bo Başûrê Kurdistanê derfetê federasyon û dewletbûnê bi xwe re aniye û hiştiye ku gotina mîna "sedsala 21. ya kurda ye" pêş bikeve. Gelo divê mirov vê yekê bi rengê ku ev nirxandina peşveçûna siyasî ya cîhanê ye an na bi rengê ku xwestekên me wisa dixwazin, bipejirîne?

**K. Î:** Ji bo ku sedsala 21. vegere sedsala kurdan û kurd bigihîjin wan mafên xwe yên ku ji zû de maf dikin, bi zêdetirî derfet derketine holê. Mesele van derfetan rast bikaranin e. Azadiyên hazir û hatine dayîn nîn in. Em nikarin qala wan bextewariyan bikin ku weke xelat li stûyê me kirine. DYA ku îroyîn hêza sûper e, destek dide ku li Başûrê Kurdistanê dewleteke kurd bê avakirin. Ev fersendeke mezin e ji bo kurdan. Ger ew destwerdana devre nebana, birayên me yên Başûrî nikaribûn xwe bigihandana vê encamê. Heman rewş ji bo parçeyên dîtir jî derbas dibe. Ji bo ku kurd bigihîjin azadiya xwe dînamîkên hundirîn bingeh in, lê bele îro li Rojhilata Navîn ew mercên weke pêzdarez, psîkolojiyên civakî, kevneşopiyên siyasi, çonayetiya têkiliya dewlet û gelan ku ava bûye, hiştine ku hetanî destwerdana derve pêk neye, ji bo dema nêzîk ne mimkûn e ku li Rojhilata Navîn statûkoya paşverû bê

şikandin. Ev yek bi zelalî datîne holê ku ev pêk neyê di herêmê de sîstemên demokratîk ava nabin.

Dewletbûna li Başûrê Kurdistanê; çarenûsa gele kurd ji binî ve bandor kiriye û pêşketineke wisa dîrokî ye ku, dê berê dehsalên pêş me diyar bike. Dewleta Kurdistana Federe ku bûyera heri mezin a 60 salên dawî ye, divê bê parastin û pêşxistin. Divê hemû pîlanên xebatê yên siyasi, çandî û civakî yên gele kurd ku 45 mîlyon e, di xala yekemîn de cih bigire. Baweriya min ew e ku, ji vê mezintir peywira pîroz a kurdê nûjen tune ye. Gava ku birayek mala xwe ava dike, birayên din alîkarî pê didin. Îro xerc, tuxle û hosteyên birayên Başûrî amade ye û temel hatiye avêtin. Birayên Bakûrî, Rojhilatî û Rojavayêbaşûrî ji bo ku avahî kamil bibe, divê şev û roj kevir rakin û xerca xwe tevlî bikin.

## KURD LI QAZAKISTANÊ XWEDÎ HER CURE MAFÎ NE

**H. Ş:** Birayek jî li dîasporayê ye.

**K. Î:** Belê, belê. Di pirtûka te ya dawî de cihekî mezin hatibû veqetandin ji bo têza "parçeyê pêncemîn". (Dikene).

**H.Ş:** Em li ser rewşa kurdên dîasporayê û weke şênberî jî li ser rewşa gelê me yê li Qazakistanê nesekinîn. Min dît ku li Qazakistanê ji bo pêşveçûna gelê me di warê civakî, çandî û perwerdeyî de nîvengeke erênî hatiye afirandin. Di salên derbasbûyî de ku li Qazakistanê dersên zimanê kurdî dest pê kiribû, dewleta Tirkiyê vê yekê protêsto kiribû. Qazakistan ji wan protêstoyan bandor negirtibû û mafê perwerdedîtina zarokên kurdan paşçav nekiribû. Wisa tê fêmkirin ku ji rêgezên xwe yên demokratîk tawîz nedan.

**K.Î:** Qazakistan dewleteke serbixwe ye. Piştî hilweşîna Sovyetê serxwebûna xwe ragihand û paşê jî di warê aborî, civakî, çandî û siyasî de leza pêşveçûneke cidî wergirt. Azadiyên siyasî û demokratîkbûn, bi vê wateyê nasîn û sepandina mafên hindikahiyan, di van dehsalên dawî de pêşveçûnên cidî pêk hatine. Di welatê me de ji 100'an zêdetir hindikahiyên neteweyî-etnîkî peyda ne. Li hember mafên hindikahiyan rêzdarî, parastin û pêşvebirina ziman û çanda etnîkî, di bin kontrola serokomar Nursultan Nazarbayev de tê birêvebirin. Birêz serokomar, bi xwe peywira serektiya Yekîtiya Gelên Qazakistanê hildaye ser xwe. Piştî hilweşîna Sovyetê tekane komar Qazakistan e ku mînanî komarên din ên Sovyetê pevçûnên neteweyî û etnîkî lê neqewimîne. Di welatê me de ku ji sedî zêdetir yekeyên etnîkî lê peyda ne, nîvenga xweşbîniyê ku hatiye afirandin û siyaseta neteweyî ku tê meşandin weke mînak e ji bo wan welatên ku dibêjin me bi dehsalan xwe bi sîstema demokratîk bi rê ve biriye.

Li Qazakistanê ji bo pêşvebirina neteweyî û çandî ya kurdan ti asteng nîn in. Berevajî, projeyên çandî û perwerdeyî ji hêla dewletê ve destek dibînin. Li her devera ku kurd lê dijîn, di dibistanên bingehîn de dersên zimanê kurdî têne dayîn. Dîsa pirtûka min a bi navê "Zimanê Kurdî" ku ji du cîldan pêk tê, ji hêla Wezareta Perwerdehî ya Qazakistanê ve hatiye qebûlkirin. Ev pirtûk ji bo komên 2-5 û 6-9 hatine amadekirin û di demeke nêzîk de dê bên çapkirin û li zarokên kurd bêne belavkirin. Em xwedî her cure derfetê rêxistinbûnê ne. Weke hemwelatiyên wekhev derfetên me yên pêşveçûna aborî û civakî hene.

Bêguman gelek pirsgirêkên me di warê çandî, civakî û perwerdeyî de hene. Ev piranî bingehên xwe ji me digirin. Em dikarin bi hewldaneke mezintir çareser bikin.

## DOSTANÎ HÊZEKE MEZIN E

**H. Ş:** Mamoste Kinyaz, sohbeteke dirêj bû ev. Gelek mijar hene ku ez dixwazim li ser rawestim, lê divê ez wan pirsên xwe bihêlim. Ez dixwazim ku hûn bi gotinên xwe dawî li axaftinê bînin...

Di sala 67'an de helbestvanê me yî mezin Evdirehman Hejar Mukriyanî hatibû Êrîvanê. Ez pê re weke wergêr çûme Bakûyê. Rojekî ku em di kolanên Bakûyê de dimeşiyan ji min re wiha got: "Keko, dijminên me stemkar in. Maf û peywira me ye ku em li hember wan têbikoşin û li ber xwe bidin. Lê belê ji bo rizgariya gelê me, divê em bi gelên cîhanê re dostaniyan ava bikin." Ev gotin min hizirandibû. Lê belê min wê demê kûrbûna gotinên hostayê mezin Hejar baş fêm nekiribû.

Pêşveçûnên van deh salên dawî yên teknolojiyê cîhana me xistiye biçûk. Girîngiya mirovê siyasî û heta ya têkiliya berjewendiyê bilind bû.

Ez ne di wê baweriyê de me ku cîhan bi awayekî dijminî nêzîkê kurdan dibe. Ruh haliyekî wisa mirovan ber bi berxwedêriyê ve dişemitîne, lê belê nabe encamwergirtina dawî. Ger di bingeh de tu lê binêrî, qasî ku tu diafirînî dostên te hene û qasî diafirînî dijminên te hene. Derfetên me yên afirandina dostan û van ji bo rizgariya gelê me dana şixulandin, îro ji her demê bêtir in. Weke yekî ku di hemû jiyana xwe de lêkolînên wêjeyî yên mijarên dostaniya navbera gelan hilkolaye ez bibêjim, baweriya min heye ku emê hêza mezin a dostaniyê bixin bin xizmeta azadiyê.

**Kurdistan-post**
**Hejarê Şamil**
**nivîskar**

CAUCASUS KURDISH SCIENTIFIC RESEARCH CENTER

Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê

* 405632427 *